

Karkirina Ceribandinî li Pêşeyê

Kurmancî



Bi xêr hatî

Li vê lênivîskê me agahiyên bikêr û bi mifa derheq fêrbûna pizişkîyê, Karkirina bi awayê subsîd (alîkariya dewletê), Karkirina ceribandinî, fêrkariya seretayî ji bo tevlîbûna li bazara kar (IGU) an karkirinê, berhev kirine û radestî te kirne.

Tu dikarî li vir li ser 10 pêşe û meslekan bixwînî û bizanî ku meriv çawa ji hinek wan pêşeyan-meslekan hîn dibe, karê ku karkerên wê pêşeyê dikin çî ye.

Karkirina Ceribandinî li nav kompaniyekê rêkareka gellek baş ji bo nskirina herî pirr a bazara kar a Danîmarkayê, naskirina pêşe û karên cûrbicûr û pêkanîna şebeke û torên karî yên kesane ji riya hevdîtian bi hevkaran e.

Li cihê karkirinê tu dê hevkarên nû nas bikî û zanist û tecrubeya karî ya nû werbigirî ku renga bibe sedema karkirina te ya hertimî an bi cûrekê baweriyekê pêk bîne û rêyeka nû ji bo bidestxistina şolê û fêrbûnê nîşanî te bide.

Ji bo wergirtina agahî û zanyariyên zêdetirê - Heke dixwazî kurteyek ji derfetên şolî yên heyî yên xwe bibîne - Heke derbarê karkirin, Fêrbûna seretayî ji bo tevlîbûn û sazûna digel bazara kar (IGU), Karkirina bi awayê subsîd (alîkariya dewletê), fêrbûna karê pizişkî an Karkirina ceribandinî pirsek di mejiyê te da heye.

Digel Navenda peydakirina kar a navçeya xwe bikeve têkilliyê - Em dê alîkariya te bikin.

Lênivîska karkirina ceribandinî li Pêşeyê ji aliyê Navenda Fêrkirin û Geşepêdana Pisportiyên kesane ya Kompetencecenter Skanderborg li Skanderborg va hatiye amadekirin.

Dikarî vê lênivîskê ji malpera jobnet.dk daxînin.



Neqlîye/karê barkêşî



Karên te

- Barê pakêt û tiştan werbigirî
- Pakêtan, tiştan li makîneyan bar bikî
- Barê makîneyan bigihînî dest muşterîyan
- Makîneyên xwe paqij bikî û li kêmasiyên wê tamam bikî

Cîhên ku tu dê lê kar bikî

- Kargehên neqlîyê/barkeşî
- Şirketên mezin ên şexsî
- Şirketên otobasê
- Li bendergehê deryayê Ports

Karkirina Ceribandinî li kompaniyekê

- Bi vê ceribandinê, zanînen te li ser wî karî zêdetir dibin
- Tu dê kesên ku wî karî dikin, binasî
- Tu dê xwedankarekê binasî û hevalên te yê nu dê çêbibin
- Tecrubeyên te yê li ser wî karî dê zêdetir bibin
- Karkirina Ceribandinî li kompaniyekê dikare piştra derfetên te yê karkirinê baştir bike

Taybetmendiyan te yan şexsî ku lazim e hebin

- Tu lazim e hez bikî ku xizmet û alîkariyan bidî muşterîyan
- Xwendin, axaftin û famkirina Zimanî Danîmarkî an Inglîsî serpişkiyek tê hesab
- Tu lazim e hez bikî ku arîkariyê kesên bikî û xizmetek baş pêşkeş bikî.
- Lazim e tu ji xebatê hez bikî, hewêsa te yê ji bo hînbûna tiştên nû, hebe
- Kesek rûnerm û ji bo hevkarîyê, baş bî.
- Lazim e ku tu bikarî li bin destê berpirsekî/ê da karê xwe bikî.

Pêdivî

- Tu lazim e her roj di wextê xwe da li ser kar bî
- Tu lazim e peyman/qirarên xwe bibî serî
- Tu lazim e hazir bî ku sibê zû jî li ser karê xwe bî
- Lazim e tu jî wekî karkerên din, li gor qanûn û edetên kargehê tevbigêrî
- Pirs bike, eger te ji karekê fêhm nekirîye.
- Bila mereqa te hebe
- Ajoname/ehlîyetnameya ajotinê ya otomobilê, bas, kamîyon û taksî eger tu dixwazî bibî şofêr

derfet û îmkanên perwerdeyê, wek mînak, tu dikarî bibî;

- Şofêrê kamîyonê
- Şofêrê basê
- Şofêrê taksîyê
- Şofêrê qolengê/makîna ku tiştên giran radike.
- Hazirkerê qîtarê/tîranê
- Karkerê bendergehê deryayê û têrmînalê.

Metbex û Qantin



Karên te

- Hazirkirina xwarinê ligel hevkarên xwe
- Germkirina xwarinê
- Sandwîç
- Selete
- Patina nênan û çêkirina kêk û kulîçêyan
- Amadekirina sîfrê û pêşkeşkirina xwarinê
- Dagirtina bufêta xwarinan
- Paqijî û berhevkirina surfê, piştî xwarinê

Cihên ku tu dikarê lê kar bikî

- Cihên wekî baxçê sawayan/zarokan, cihê pîr û kal lê dimînin, dibistanên taybet (Højskole), dibistanên xwarinçêkirinê
- Şirketên xususî yê xwarinê çêdikin, difiroşin
- Dibistan û perwergehên dewletê

Karkirina Ceribandinî li kompaniyekê

- Bi vê ceribandinê, zaninên te li ser wî karî zêdetir dibin
- Tu dê kesên ku wi karî dikin binasî
- Tu dê xwedankarekê binasî û hevalên te yê nu dê çêbibin
- Tecrubeyên te yê karî dê zêdetir bibin
- Karkirina Ceribandinî li kompaniyekê dikare piştra derfetên te yê karkirinê baştir bike

Taybetmendiyan te yê şexsî ku lazim e hebin

- Tu lazim e hez ji çêkirina xwarinan bikî
- Xwendin, axaftin û famkirina Zimanî Danîmarkî an Inglîsî serpişkiyek tê hesab
- Lazim e tu ji xebatê hez bikî, hewêsa te yê ji bo hînbûna tiştên nû, hebe
- Ji bo hevkarîyê baş bî
- Lazim e ku tu bikarî li bin destê berpirsekî/ê da karê xwe bikî

Pêdivî

- Tu lazim e her roj di wextê xwe da li ser kar bî
- Tu lazim e bizanî çawa xwarinên bi hêşînahî, goştê masî, mirîşk, golik, çêlek û beraz/ xinzir tî çêkirinê
- Lazim e tu jî wekî karkerên din, li gor qanûn û edetên kargehê tevbigerî
- Tu lazim e qebûl bikî ku li cihê karê te goştê beraz/xinzirê jî heye
- Pirs bike eger te ji karekî fêhm nekiriye
- Bila meraqa te hebe
- Laşê te bi quwwet û hêz be
- Tu lazim e bikarî sibê zû jî li ser karê xwe bî
- Karên xwe bi lez bikî

Derfêta û îmkanên perwerdeyê, wek mînak, tu dikarî bibî;

- Aşpêz
- Aşpêzê mezin, pisporê karê çêkiirna xwarinê
- Assistantê/alîkarê li cihên xwarinê
- Kesê ku sandîwîçan çêdike
- Karkerê li qantînan ku karê cur be cur dike
- Garson/ berkar
- Nanpêj
- Hostayê şîrînahî, kêk û kulîçeyan

Hostetî û pêşe



Karên ku tu dê bikî;

- Nûkirin, rastkirina xanî û avahîyan
- Avakirina xanî û fabrîkeyan
- Xwedîkirina avahîyan û alavên li dibistanan
- Karkirin li kargehan, wek mînak li kargehên hesinkariyê.
- Xwedîkirina hewş û parkên civakî
- Neqlîye/ birin û anîna alavên hostetîyê
- Xwedîkirina otomobîlan, motoran û makînan

Cîhên ku tu dê lê karbikî

- Bal Hostayên xwedî pêşe
- Şirketên ku xanî û avahîyan çêdikin
- Şirketên fermî yê dewletê
- Dibistan û perwerdegehan
- Şirketên xanîyan

Karkirina Ceribandinî li kompaniyekê

- Bi vê ceribandinê, zaninên te liser wî karî zêdetir dibin
- Tu dê kesên ku wi karî dikin binasî
- Tu dê xwedankarekê binasî û hevalên te yê nû dê çêbibin
- Tecrubeyên te yê li ser wî karî dê zêdetir bibin
- Karkirina Ceribandinî li kompaniyekê dikare piştra derfetên te yê karkirinê baştir bike

Taybetmendiyan te yê şexsî ku lazim e hebin

- Lazim e ku kêyfa te bi karên hostetî û pêşeyî bê
- Xwendin, axaftin û famkirina Zimanî Danîmarkî an Inglîsî serpişkiyek tê hesab
- Lazim e tu ji xebatê hez bikî, hewêsa te yê ji bo hîbûna tiştên nû, hebe
- Hevkarekî baş bî
- Xwedanfikir bî û bikarî serbixwe gelek karan bikî
- Lazim e ku tu bikarî li bin destê mesulekî da karê xwe bikî

Pêdivî

- Tu lazim e her roj di wextê xwe da li ser kar bî
- Lazim e kêyfa te bi karkirina li derva, bê
- Te cismek baş û bi quwwet û hêz hebe
- Lazim e tu jî wekî karkerên din, li gor qanûn û edetên kargehê tevbigêrî
- Pirs bike eger te ji karekê fêhm nekiriye
- Bila meraqa te hebe
- Eger icaza şofêrîyê te hebe pîr baş e, lê mecbûrî nine
- Tu lazim e sibê zu da jî li ser karê xwe bî

Derfet û îmkanên perwerdeyê, wek mînak, tu dikarî bibî;

- Dartraş/Neccar
- Dartraş, hostayê alavên darinî
- Hostayê çêkirina xanîyan
- Elektrîkçî/kehrebaçî
- Kesê ku bi aw, germî û hewayê nav malê kar dike
- Kesê ku dersa karê ax û betonê xwendîye
- Kesê ku dersa bihevlikandina beşên xanî û avahîyan xwendîye
- Hostayê danîna kevirên li kêlekên rê û caddeyan
- Baxçewan
- Kesê ku dersa isolekirina xanî û avahîyan xwendîye
- Hesinker
- Erddanêr (kesê ku erdê li nav xanîyan çêdike)

Dibistan û perwerdegeh



Karên te

- Xwedîkirin zarok û ciwanan û wextborîn tev li wan
- Amadekirin û dayîna xwarinê zar û ciwanan
- Tev li zar û ciwanan biçî sefer û geryanê
- Çalakiyên cûrbicûr, wek minak nîgarkêşan, rengkirin, lîstik, sitran gotin, tev li zar û ciwanan
- Berhevkirina cihê, paqijîya sivik.
- Hevkarî bi dê û bavên zar û ciwanan va

Cihên karkirina te

- Dibistan û perwerdegehên zar û cîwanan
- Dibistan û perwerdegehên zar û cîwanan-yên ku zar û cîwanan şev û roj lê dimînin (leylî)
- Dibistan û kluban

Karkirina Ceribandinî li kompaniyekê

- Zaninên te li ser vî karî zêdetir dibin
- Tu dê kesên ku wi karî dikin binasî
- Tu dê xwedankarekê binasî û hevalên te yê nu dê çêbibin
- Tecrubeyên te yê karî dê zêdetir bibin
- Karkirina Ceribandinî li kompaniyekê dikare piştra derfetên te yê karkirinê baştir bike

Taybetmendiyan te yê şexsî ku lazim e hebin

- Tu hez bikî ligel zarok û ciwanan bî
- Xwendin, axaftin û famkirina Zimanî Danîmarkî an Inglîsî serpişkiyek tê hesab
- Lazim e tu ji xebatê hez bikî, hewêsa te yê ji bo hînbûna tiştên nû, hebe
- Ji bo hevkarîyê baş bî
- Bikarî tiştên nu biafrinî
- Lazim e ku tu bikarî li bin destê mesulekî da karê xwe bikî

Pêdivî

- Tu lazim e her roj di wextê xwe da li ser kar bî
- Lazim e tu jî wekî karkerên din, li gor qanûn û edetên kargehê tevbigerî
- Pirs bike eger te ji karekê fêhm nekiriye
- Tu lazim e bikarî sibê zu da jî li ser karê xwe bî
- Bila mereq a te hebe
- Tu lazim e qebûl bikî ku li cihê karê te goştê beraz/xinzirê jî heye
- Tu kesekî bisebir, dilfireh bî û bizanî bî arikariyê xelkê bikî

Derfêta û îhtimalkan perwerdeyê, wek mînak, tu dikarî bibî;

- Karkerê baxçê sawayan/zarokan (Rawza)
- Alîkarê/a Karkerê baxçê sawayan/zarokan
- Alîkarê/a karkerê baxçê sawayan/zarokan
- Mamoste

Karê Dukandarî



Karên te

- Pêşwazîya muşterîyan
- Paqijî û temizî kirin
- Berpirsiyariya qaseya pereyan
- Danîna tiştan/eşiyayan li cihê wana û dagirtina refên tiştan.
- Tiştan ji paketan bîni der û kîseyan bi tiştan dagirî.

Cihên karkirina te

- Li supermarkêtan
- Dukanên cilfiroşan
- Dukanên leyîstokan
- Dukanên Solan
- Markêta tiştên hostetîyê xaniyan
- Pirtûkfiroşî
- Û hemû cureyên din yê market û dukanan

Karkirina Ceribandinî li kompaniyekê

- Tu dê kesên ku wi karî dikin, binasî
- Tu dê xwedankarekê binasî û hevalên te yê nu dê çêbibin
- Tecrubeyên te yê li ser wî karî dê zêdetir bibin
- Di saya vê ceribandinê da îmkânên te yê ku tu di paşerojê da karekî xwe bibînî, zêdetir dibin
- Karkirina Ceribandinî li kompaniyekê dikare piştra derfetên te yê karkirinê baştir bike

Taybetmendiyan te yê şexsî ku lazim e hebin

- Hêza te li ser xizmetkirina muşteriyên hebe
- Tu hez bikî ku ligel xelkê deng bikî, biştexalî
- Xwendin, axaftin û famkirina Zimanî Danîmarkî an Inglîsî serpişkiyek tê hesab
- Lazim e tu ji xebatê hez bikî, hewêsa te yê ji bo hînbûna tiştên nû, hebe
- Kesek rûnêr) û ji bo hevkarîyê, baş bî
- Lazim e ku tu bikarî li bin destê mesulekî da karê xwe bikî.

Pêdivî

- Tu lazim e her roj di wextê xwe da li ser kar bî
- Lazim e tu jî wekî karkerên din, li gor qanûn û edetên kargehê tevbigêrî
- Pirs bike eger te ji karekê fêhm nekiriye
- Bila mereq a te hebe
- Pejirandina guhertina wextên hatîna te yê ser kêr û çûna malê.

Derfêt û îmkânên perwerdeyê, wek mînak, tu dikarî bibî;

- Asîstan/arîkarê dukanê
- Asîstanê kîrrînê
- Asîstanê bazîrganî

Depo/Embar û logistik



Karên te

- Wergirtina bar û pakêtan li depoyê
- Pakêt û tiştan li depoyê yan nav dukanê bi cih bikî
- Tişt û pakêtan ji bo muşterîyan bişînî
- Bar û pakêtan bigihînî muşterîyan
- Tişt û alavan paket bikî
- Kontrolkirin û hêjmartina tişt yan pakêtan

Cihên ku tu dikarî lê kar bikî

- Terminala bar û berheman
- Kargehên biçuk û mezin
- Supermarkêt
- Li kargehên taybet û mezin ku tiştan difiroşin dukanên biçûktir.

Karkirina Ceribandinî li kompaniyekê

- Bi vê ceribandinê, zanînen te yên li ser vî karî zêdetir dibin
- Tu dê kesên ku wi karî dikin binasî
- Tu dê xwedankarekî binasî û hevalên te yên nu dê çêbibin
- Tecrubeyên te yên li ser vî karî dê zêdetir bibin
- Karkirina Ceribandinî li kompaniyekê dikare piştra derfetên te yên karkirinê baştir bike

Taybetmendiyan te yên şexsî ku lazim e hebin

- Lazim e ku laş û cismê te bi quwwet û hêz be
- Lazim e tu karê xwe bi nizam û rêk û pêk bikî
- Xwendin, axaftin û famkirina Zimanî Danîmarkî an Inglîsî serpişkiyek tê hesab
- Lazim e tu ji xebatê hez bikî, hewêsa te yê ji bo hînbûna tiştên nû, hebe
- Ji bo hevkarîyê baş bî
- Tu lazim e ku bikarî li bin destê mesulekî da karê xwe biki

Pêdivî

- Tu lazim e her roj di wextê xwe da li ser kar bî
- Lazim e tu jî wekî karkerên din, li gor qanûn û edetên kargehê tevbigêrî
- Pirs bike eger te ji karekê fêhm nekiriye
- Bila mereq a te hebe
- Tu lazim e sibê zu da jî li ser karê xwe bî
- Lazim e bikarî karekî ku zêdeyî wextê te li ser piyan û bi meşê derbas dibe, bikî.

Derfêt û îmkanên perwerdeyê, wek mînak, tu dikarî bibî;

- Karkarê depo/embarê
- Operatorê depoyê
- Şofêrê makîna ku bar û pakêtan radike
- Rêveberê depo yan terminalê

Hilberîn / paketkirin / montaj



Karên ku tu dê bikî

- Komkîrîn û daliqandin a berheman
- Kontrolkîrîna kuwalîteyê
- Paketkîrîna berheman û şandîna wan ji bo muşterîyan
- Dabeşkirin û hêjmartina berheman
- Mesulîyeta depoyê
- Hevkarî ligel hevkarên xwe
- Temizî û paqijkîrîn

Cihên ku tu dikare lê kar bikî

- Firma/şîrketên mezin û biçuk
- Şîrketên mezin ku tiştan difiroşin dukanên biçuhtir
- Kargeh û karxane

Karkirina Ceribandinî li kompaniyekê

- Bi vê ceribandinê, zaninên te li ser wî karî zêdetir dibin
- Tu dê kesên ku wi karî dikin binasî
- Tu dê xwedankarekê binasî û hevalên te yên nu dê çêbibin
- Tecrubên te yên li ser wî karî dê zêdetir bibin
- Karkirina Ceribandinî li kompaniyekê dikare piştra derfetên te yên karkirinê baştir bike

Taybetmendiye te ye şexsî ku lazim e hebin

- Lazim e laş/cismê te bi quwwet û hêz be
- Lazim e tu karê xwe b nizam û rêk û pêk bikî
- Xwendin, axaftin û famkirina Zimanî Danîmarkî an Inglîsî serpişkiyek tê hesab
- Lazim e tu ji xebatê hez bikî, hewêsa te ye ji bo hînbûna tiştên nû, hebe
- Lazim e ku tu bikarî li bin destê mesulekî da karê xwe bikî

Pêdivî

- Tu lazim e her roj di wextê xwe da li ser kar bî
- Lazim e tu jî wekî karkerên din, li gor qanûn û edetên kargehê tevbigêrî
- Eger te ji karekî fêhm nekirî bipirse
- Bila mereq a te hebe
- Lazim e laş/cismê te bi quwwet û hêz be
- Tu lazim e sibê zû da jî li ser karê xwe bî

Derfêt û îmkanên perwerdeyê, wek mînak, tu dikarî bibî;

- Operatorê kargehê (Kesê ku makînan bi kar tîne)
- Alîkarê berhemînanê
- Karkerek ku bikare li ser berhemekê taybet kar bike
- Kursên taybet bi karkirinê û kargehan

Paqijî û Xizmet



Karên ku tu dê bikî

- Şuştina erdê
- Gêzikirin û temizkirin/paqijkirin
- Tozjêbirin
- Paqijîya tuwalêt û hemaman
- Şuştina derencan
- Paqijkirin
- Valakiirna zibildankê (çop/glêşî)
- Amadekirina çay û qehwê
- Amadekirina maseya nanxwarinê û piştî wê berhevkirina wê

Cihên ku tu dikarî lê kar bikî

- Debistan
- Kargeh/şîrket
- Nivîsgeh/ofîs
- Malên taybet
- Perwerdegeh/Dibistanên dewletê û avahîyên şarewanî/beledîyê

Karkirina Ceribandinê li kompaniyekê

- Bi vê ceribandinê, zaninên te liser wî karî zêdetir dibin
- Tu dê kesên ku wi karî dikin binasî
- Tu dê xwedankarekê binasî û hevalên te yê nu dê çêbibin
- Tecrubeyên te yê karî dê zêdetir bibin
- Karkirina Ceribandinê li kompaniyekê dikare piştra derfetên te yê karkirinê baştir bike

Taybetmendiyan te yê şexsî ku lazim e hebin

- Tu hez ji paqijkirin û temîzkirinê bikî
- Tu hez ji xizmetkirina xelkê bikî
- Tu lazim e karê xwe baş bikî û çavên te li ser her tiştî bin
- Xwendin, axaftin û famkirina Zimanê Danîmarkî an Inglîsî serpişkiyek tê hesab
- Lazim e tu ji xebatê hez bikî, hewêsa te yê ji bo hînbûna tiştên nû, hebe
- Lazim e ku tu bikarî li bin destê mesulekî da karê xwe bikî.


Pêdivî

- Tu lazim e her roj di wextê xwe da li ser kar bî
- Lazim e tu jî wekî karkerên din, li gor qanûn û edetên kargehê tevbigêrî
- Pirs bike eger te ji karekê fêhm nekiriye
- Bila mereq a te hebe
- Te laş/cismek baş û bi quwwet û hêz hebe
- Tu lazim e sibê zu da jî li ser karê xwe bî

Derfêta û îmkana perwerdeyê, wek mînak, tu dikarî bibî

- Karkerê xizmetê xelkê
- Karkerê paqijiyê
- Dikarî kursa pak û temiziyê bigirî
- Dikarî kursên cur bi cur yê li navenda AMU bigir

Karê xwedîkirin û hewandinê kesên berdestî/Nexweş



Karên ku tu dê bikî

- Tu dê li cem ew kesên berdestî bî, arîkarîya wan bikî, bi xemên wanan mujil bî
- Ji wan ra xwarinê amade bikî û bidî ber wan.
- Tev li wan biçî geryanan, ji bo wan tiştan bikirrî.
- Karûbarên xwedîkirinê yên rojanê
- Paqijî
- Hevkarî ligel meriv û xismên kesê nexweş/berdestî

Cihên ku tu dikarî lê kar bikî

- Malên parastî
- Cihên pîr û kalan dihewinîn
- Cihê zarokên nexweş/berdestî dihewînîn
- Malên taybetî/şexsî

Karkirina Ceribandinê li kompaniyekê

- Bi vê ceribandinê, zaninên te liser wî karî zêdetir dibin
- Tu dê kesên ku wi karî dikin binasî
- Tu dê xwedankarekê binasî û hevalên te yê nu dê çêbibin
- Tecrubeyên te yê karî dê zêdetir bibin
- Karkirina Ceribandinê li kompaniyekê dikare piştra derfetên te yê karkirinê baştir bike

Taybetmendiyan te yê şexsî ku lazim e hebin

- Tu lazim e ku hez ji xwedîkirin û hewandina kesên berdestî/nexweş bikî
- Tu hez bikî ku ligel nexweşên kêmendamiyê/seqet û pîr û kalan bî.
- Xwendin, axaftin û famkirina Zimanê Danîmarkî an Inglîsî serpişkiyek tê hesab
- Lazim e tu ji xebatê hez bikî, hewêsa te yê ji bo hînbûna tiştên nû, hebe
- Ji bo hevkarîyê baş bi
- Lazim e ku tu bikarî li bin destê mesulekî da karê xwe bikî.

Pêdivî

- Tu lazim e her roj di wextê xwe da li ser kar bî
- Lazim e kêyfa te bi karkirina li derva, bê
- Te laş/cismek baş û bi quwwet û hêz hebe
- Lazim e tu jî wekî karkerên din, li gor qanûn û edetên kargehê tevbigêrî
- Pirs bike eger te ji karekê fêhm nekiriye
- Bila mereq a te hebe
- Tu lazim e qebûl bikî ku li cihê karê te goştê beraz/ xinzirê jî heye
- Tu kesekî bisebir, dilfireh bî û bizanî arikariyê kesên bikî

Derfêt û îmkanên perwerdeyê, wek mînak, tu dikarî bibî;

- Arikarê social û tendurustiyê
- Assistantê social û tendurustiyê
- Sister/mumerize/hemşîre

Çandinî/Baxvanî/Daristanvanî



Karên ku tu dê bikî

- Ji heywanên malê muqatekirin
- Xerman û karê zevyê
- Xwedîkirina ciyên kesk
- Çikandin û çandina tovan
- Çiqillêdan, qutkirina daran û xwedîkirina daristan û deverên xwezayê
- Rêbazên çêkirinê, danîna keviran û kevirên raxistî
- Xwedîkirin û çêkirina baxçe û parkan
- Kontrola pirrparr û buhukan
- Çandin û muqatebûna ji gihayên guldankê, sebze,, darik û daran
- Xizmetên bo mişteriyên

Cihên ku tu dikarî lê kar bikî

- Şitilxane
- Navendên Baxçeyan û gulxane
- Zeviyên çandinê
- Çavdêriya daristanan û dorberê
- Goristan, park û baxçeyên taybet
- Dezgeh û navend
- Encumena dayîna xaniyan

Karkirina Ceribandinî li kompaniyekê

- Hûn ê vê pêşeyê nas bikin
- Hûn ê li vî pêşeyî da torrekê ava bikin
- Hûn ê xwediyê kar û hevkarên nû nas bikin
- Hûn ê tecrubeyê wergirin
- Karkirina Ceribandinî li kompaniyekê dikare piştra derfetên te yê karkirinê baştir bike

Şiyanên ferdî

- Hûn divê bixwazin bi xweza, jîngeh, giya û heywanan ra kar bikin
- Xwendin, axaftin û famkirina Zimanî Danîmarkî an Inglîsî serpişkiyek tê hesab
- Hûn divê bixwazin kar bikin û tiştên teze fêr bibin
- Baş hevkarîkirin
- Serbixwe û xwedan însiyatîv
- Hûn divê bikaribin bin çavdêriya birêvebiriyê kar bikin

Pêdivî

- Hûn divê rêkûpêk û her rojê li demê da werin
- Hûn divê karkirina li derve hez bikin
- Divê bedena we xurt be
- Hûn divê heman qanûnê bişopînin ku hevkarên we dişopînin
- Eger erka xwe fehm nakin, bipirsin
- Şopîner bin
- Hebûna ajonameyekê serpişkiya baş e lê gerek nine
- Sibeyan zû werin ser karê xwe

Mînakên imkanên perwerdeyê

- Cotkarî, heywanên kedîkirî
- Cotkar, giya
- Arîkariya cotkariyê, giya yan heywanan
- Birêvebirina hespan
- Ajokarê dezgehên çandiniyê
- Xwedîkirin
- Baxçevaniya dîmenan
- Baxçevan
- Berpîrsê gulan
- Teknîsiyenê daristan û xwezayê
- Danîna kevirên raxistî
- Baxçevaniya dîmenan

Not hildan

Zanyarî û agahiyên zêdetirê

Bona naskirina derfetên şolî yê ceribandî yê xwe li Kompaniyan bi Navenda Peydakirina Kar a Navçeya xwe bikeve têkilliyê.

Lînka bo navenda peydakirina kar li navçeya min:

info.jobnet.dk/mit-jobcenter.

Mafê tekalî yê çapkirin û zêdekirina Lênivîska Karkirina Ceribandinî li Pêşeyê

© KOMPETENCECENTER SKANDERBORG

Versiyon anku Nusxeya Dîcîtal a Lênivîska Karkirina Ceribandinî li Pêşeyê, sala 2018an ji aliyê Enstîtûya Danîmarkî ya Bazara Kar û Bikarwergirtinê va hatiye weşandin.

Dikarî vê lênivîskê ji malpera jobnet.dk daxîni.

Styrelsen for Arbejdsmarked
og Rekruttering
Vermundsgade 38
2100 København Ø

T. 7221 7440
E-mail. star@star.dk
www.star.dk